Folkhälsomyndigheten

VACCINATION MOT INFLUENSA OCH COVID-19, OKTOBER 2023, KURMANJI

Aşîlêdana li dijî şopa Covid-19

Folkhälsomyndigheten (Dezgeha Tenduristiya Gel) bo hemî kesên 65 salî û mezintir û bo kesên din ên di nav komên xeteriyê de ne pêşniyar dike, daku aşîlêdanê bikin.

Aşîlêdan belaş e

Folkhälsomyndigheten, derbareyê van tiştan we aghehdar dike:

- Kesên di nav komên xeteriyê de ne, ew ji bo aşîlêdana şopa Covid-19 pêşemîn têne girtin. Ji bo mirovên li komên xeteriyê, aşîlêdan li seranserê welêt belaş e.
- Di heman demê de aşîlêdana dijî grîpa demsalî û Covid-19 tiştekî baş e.
- Di vê zivistanê de îhtimal heye, ku hem grîp û hem jî Covid-19 belav bibin. Loma aşîlêdan riya herî baş e ji bo parastina wan kesên ku wan xeter heye ku giran nexweş bikevin.
- Aşîlêdan ji nexweşiyê sedî sed naparêze, lê heger hûn herçend aşî bûbin jî dîsan nexweş bibin hingê enfeksiyonê sivik dike.

Grûpên rîskê pêşemîn têne girtin

Komên jêrîn ji bo aşîlêdana li dijî grîpê û Covid-19 têne pêşniyarkirin û ji bo alîlêdanê (bê rêzeke taybetî) pêşemîn têne girtin:

- Kesên ku 65 salî yan mezintir in.
- Jinên ducanî yên piştî hefteya 12
- Salmezinên 18 salî û mezintir ên bi nexweşî, bi teşhîs an jî bi şert û mercên jêrîn:
  - Nexweşiya dil û vaskuler (damar) a kronîkî tevî felcê. Ji bo Covid-19 jî hîpertansiyon (tansiyona bilind).
  - Nexweşiya pişikê ya kronîkî, wek KOL û astima giran an bêîstîqrar.
  - Semptom an şert û mercên din ên ku dibin sedema xerabûna fonksiyona pişikê yan kêmbûna hêza kuxikê (mînak, qelewbûna giran, nexweşiyên neuromuskuler (esabiyeta masilê) yan kêmbûna gelek fonksiyonan).
  - Têkçûna kezebê yan gurçikê a kronîkî.
  - Nexweşiya şekir mellîtûs 1 û 2.
  - Li ew mercên ku yan ji ber nexweşiyê, yan jî ji ber dermankirinê, tevî Sendroma Down'ê pergala parastinê bi giranî kêm bûye.

Komên din ên ku dikarin bi taybetî ji bo aşîlêdana Covid-19 bêne hesibandin, ji bilî van komên xeternak ên diyarkirî, mirovên ku ji lêniherîna malê yan jî yên wekî wan hewceyê alîkariya bi çalakiyên di jiyana rojane de ne, û her weha mirovên derveyî teşhîsên li jor, ji ber sedemên din bi tendurustiya wan a girîng astengdar in.

Sedemên din ên weha, dibe ku nexweşiya derûnî, nefsî yan dementia (xirifîn), û her weha karhanîna zirardar a alkolê yan narkotîkayê jî hebe.

Komên jêrîn bo aşîlêdana li dijî înfluensayê têne pêşniyarkirin:

• Zarokên 6 mehî heta 17 salî yên bi nexweşî, teşhîs û şert û mercên li gor lîsteya jorîn ya ji bo salmezinan.

• Têkiliya malbatê, hem zarok û hem jî kesên salmezin, bi wan kesên ku sîstema parastina wan gelekî sist û lawaz e.

• Personelên tenduristiyê û lênerînê yên ku nêzî nexweşan û wergirên lênerînê yên bi xetereya şopa cidî dixebitin, wek mînak xebatên li xaniyên taybetî yên ji bo kal û pîran (SÄBO) û xebatên di lênerîna malê de.

Doktorên dermanker dikarin li ser pêwîstiya aşîlêdanê nirxandineke kesane bikin.